

Me 5'emîn Newro-
za bêhempa destpê kir

»»» R:7



Sala nû, sala
xweamadekirin ji
guhartinan re

»»» R:5



Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

Agirî

Newroz, mîrata
çandî ya warê
mem û zînê

»»» R:6



Efrîn û 3 salên
dagîrkerinê

»»» R:8



Duhestînameyek Siyasî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (394) 21-03-2021 Buha (1000) Tûmen

Newroza Agir û Rasan

Bi hilkefta cejna netewî ya Newrozê û hatina sala nû, rêûresmek mezin li binkeyê sereke ya PDKÎ bi amadebûna endamên rêberayeti, kadir, pêşmerge û malbatên wan hate lidarxistin.

Roja Şemî rêkevta 30`ê Reşeme ya 1399`an a Rojî, rêûresma cejna netewî ya Newrozê û hatina sersala nû ya Kurdî bi amadebûna Lêpirsyarê Gîştî, endamên Navenda Siyasî û Desteya Kargêrî, kadir, pêşmerge û malbatên Partiya Demokrat a Kurdistanê li binkeya sereke ya PDKÎ li du beş de hate lidarxistin.

Di beşa yekem de rêûresim bi sirûda Newrozî ya “Em Rojî Salî Taze ye Newroze hatewe” dest pê kir.

Piştî peyama Newrozî ya PDKÎ ji aliyê rêzdar “Mîstefa Hicrî”, Lêpirsyarê Gîştî yê Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê ve hate pêşkêşkirin.

“Mîstefa Hicrî” di detpêka peyama xwe de basa vê kir ku: “Em di rewşekê de ber bi Newroz û sala nû a 1400`an a Rojî ve diçin ku krîzên kele-



kbûyî yên nehatinî çareserkirî, domdar û encama siyaseta birêveberiya Komara Îslamî ya Îranê û ew ezmûnên tal in, ku ne tenê netewên bin destê wê welatê, belkî heta welat û gelên deverê jî, lê bêpar nebûne”.

Di berdewamiya peyamê de rêzdar “Mîstefa Hicrî” wiha daye zanîn: “Tevî rewşa herfîner a aborî û krîza Koronayê, di sala derbasbûyî de rejîma Komara Îslamî li ser siyaseta hertmiyên xwe wate mudaxilekirin di nav karûbarê navxweyî yên welatên deverê de, ew li ser ceribandina

mûşek û bernameyên xwe yên etomî rijdtir bûye. Komara Îslamî bi rêya torên berbelav ji girûpên girêdayê bi xwe ve, şerê bi nûneratî kiriye karê xwe yê yekem û li dijî deverê bikar tîne. Her ji tora wan hêzane ve, di heyama sala derbasbûyî de berdewam berjwendiyên welatên Erebi û Amerîka di deverê de kiriye bi armanc. Dezgehên ewlehî û zaniyarî yên Komara Îslamî li çend welatên cîhanê de hewla teror û binçavkirin û xistina nav telikê ya dijberên xwe daye.”

Piştî gotinên rêz-

dar “Mîstefa Hicrî” Lêpirsyarê Gîştî yê PDKÎ, stranek di bin navê “Şîrîn Behar e” ji aliyê koma mûzîkiya Koyê ve pêşkêşê rêûresmê hate kirin.

Di beşeke din de pexşaneke Newrozî bi navê “Min Newroz im” ji aliyê mamoste “Bêbeş Piroti” helbestvanê pêşmerge ve hate pêşkêşkirin.

Piştî çend stranên folklorî ji aliyê tîpa mûzîkî ya Koyê ve hate pêşkêşkirin. Piştî pêşmerge ciwan “Îhsan Reştgar” helbestek di bin navê “Agirî Newroz” de pêşkêşê amadebûyan

kir. Beşa duyem a vê rêûresmê pêkhatibû ji hilkirina agirê biruskdar ê Newroza 1400`an a Rojî (2721 a Kurdî) ji aliyê rêzdar “Mîstefa Hicrî” Lêpirsyarê Gîştî yê PDKÎ û “Kenêra Mêhfer” hejîna şehîd “Resûl Mihemedzade” hate hilkirin.

Hevdem digel birêveçûna vê cejnê li çiyayên Kurdistanê û ji aliyê Pêşmerge nîştiman ve cejna netewî ya Newrozê hate birêveçûn. Di heman demê de di herdu binkeyên “Dêgele û Cêjnîkan”ê jî cejna Newrozê û salyada ragihandina qonaxa nû a xebat li Rojhilatê naskirî bi Rasana Rojhilatê bi rê ve çû.

Di Rojhilatê Kurdistanê de jî, tevî rewşeke awirte ya polîsî bi ser gund û bajaran de, xelk bi awayekî bê mînak ber bi pêşwaziya Newrozê ve çûn û bê guhdan bi gefên rejîmê rêûresma Newrozê lidar xistin ku paşê di ragihandina Hizbê de emê hemû aliyekê agehdar bikin.

Deqa peyama Lêpirsyarê Gîştî di rûpela 3`an de hatiye weşandin

Sergotar



N: Kerîm Perwîzî

Dixwazin ne tenê gul di wê axê de şîn nebin, heta baran jî di wê nîştimanê de nebare da ku welatê me zuha bibe û çiyayên me li hember wan bêne tewandin û dolên me pir bin ji lîm û qobiyê.

Kolonîlîzma dagîrker, bi alîkariya bîr û hizra faşîstan, bi salan e êrîş kiriye li ser ax û nîştiman û ruha netewî da ku me bi awayê zelîlî ve bixe qedeman û çavên me li destê xêrên wan be da ku pariyek nan bidine me ku em dûayên xêrê bo wan bikin ku evqas baş in ku nahêlin em li bîrsiyan bimrin.

Bîra faşîstî û temaha dagîrkari û tînîtiya xwîn-mjiya wan salanek dût û dirêj e ku nîştimana me xîstine di bin çekmên xwe yê req de û bi roj xortên me dikujin û bi şevan jî xortên me bi çavên girêdayî di girtîgehên xwe de îşkence didin û bi ti tiştêkê têr nabin û em jî bi ti tiştêkê dev li daxwazên xwe bernadin.

Îsal tevî hemû ew derdên ku kolonîyalîzma Tehranê bo me bi diyarî anîne, hejarî, betalî û birîstî û dorpeç jî ku zêdetir bûn, lê nexweşiya Korona jî derd û mirin zêdetir û zêdetir kir. Îsala reş ya 1399'an a Rojî, bi qerentîne, bahoze û nexweşiya Korona, giranî û malvêranî dest pê kir û bi weşana li pey hev a belgeyên agehdariya serxweşiyan berdewam bûn û di îsal de sedan û hezaran ezîzên me ji dest çûn. Melika "merg" çadira xwe ya reş di eywan û hevşa Kurdistanê de hilda û

Vejîna Nîştiman



axûndên Tehranê jî di xweşiyan de dîkeniyan ku Korona jî hatiye û dibe alîkarê wan da ku hem mirin û tirs û givaş zêdetir be û hem jî xelk zêdetir heyrî bimînin.

Lê ya ku ti carî bo wan cihê qebûlîkirinê nebû û herdem jî ew heyrîmayî kiribûn, hişyarî û jix-wederbasbûna xweştewîtirîn xortên nîştimanê wate pêşmerge bûye ku di kolan û dol, çiya û deşt û neval û bajarên Kurdistanê de digeriyan û peyama berdewamiya berxwedaniyê bo xelkê birin û peyama xweşteviya bajar bo çiya anîn.

Herçiqas dujminan hewil daye ku sal û mehan bi bêhêvayî derbas bike, lê Newroz hertim remz û nîşaneyên mezin ên nîştimana Kurdistanê bûye û agirê pîroz ê Newrozê biruskên meşxela hêviyê ronahîtir û refên xortên canliserdeşt û xebatê qahîmtir kiriye. Newroza 2721 a Kurdî, vejîna dûbare ya hêviyan di Kurdistanê de ye û zayîna kaniyan li çiyayan e û mizgînîbexşek cuda bo paşeroja zarokên bajar e.

Newroz, hêviya doma jiyan û gura agirê xebatê zohintir û geştir dike. Newroza 2721 a Kurdî, Newroza vejîn û serhildana şoreşa jiyanê di Kurdistanê de li hemû binyatner û nemaze li tev evîndar û hogrên Rasanê pîroz be!

Peyama Newrozî ya Mistefa Hicrî Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ

Lêpirsyarê Giştî yê Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê, Mistefa Hicrî, bi hilkefta Newrozê peyamek belav kir

Deqa peyamê wiha ye:

Hevnîştimaniyên hezkirî
Xelkê têkoşer ên Kurdistanê
Em di rewşekê de ber bi
Newroz û sala nû a 1400'an a
Rojî ve diçin ku krîzên kelek-
bûyî yên nehatinî çareserikirî,
domdar û encama siyaseta
birêveberiya Komara Îslamî
ya Îranê û ew ezmûnên tal e,
ku ne tenê netewên bin deştê
wê welatê, belkî heta welat
û gelên deverê jî, lê bêpar
nebûne.

Rewaya civatgehî, yek ji
wan faktera ku liserxistina
hikûmetan bo birêvebirina
krîzan rol dilîze. Pêka rapir-
syeye bajarvaniya Tehranê,
niviya hevvelatiyan baweri-
ya wan bi amar û biryarên re-
jîmê nînin, ku wisa ye rejîm
di wê warê de jî di krîzeke
gelek kûr de ye.

Saziya Tendirustî ya Cîhanî,
piştî belavbûna nexweşiya
Korona li Îranê belav kir ku
karbideştên Komara Îslamî,
dema belavbûna wê vîrûsê bi
direngî belav kirin. Bêguman
krîza Korona, yek ji wan rû-
dayane ye ku tevî ziyana canî
û maddî, bandoreke hemûalî
li ser warên din jî hebûye.
Hekî em arîşe û krîzên berê
yên Îranê bi binema verbig-
rin, sala 1399'an, saleke pir
ji karesat û krîztirîn salê
zanîn.

Rejîm her ji deştpekê ve,
nexweşiya Koronayê wek
diyardeyeke ewlehî û teblîxî
nîşan da. Berevajiya bang-
hêjiya berpirsên payebilind
ên Spaha Pasdaran derheq
peydakirina rêçareyeke
bingehîn, niha jî digel be,
rejîmê nekariye şunwarê
malwêraniya wê nexweşiyê
biveşêre.

Yek ji pîverên cîhanî bo
beravirda rêjeya xweşbijîviya
welatan, pîvera Lîgatom
e. Pêka wê pîverê, rewşa
xweşbijîviya welatan pêka



12 xalan tê beravirdkirin ku
ev jî ev in: “Asayîş, azadiya
takekesî, hikmranî, saman
civakî, veberhênan, rewşa
karûkasibî, pêgeh, kalîteya
aborî, derfeta jiyan, tendi-
rûstî, jîngeh û perwerde”.
Pêka dawî beravirda enîstî-
tûya Lêgatom, Îran di nav
167 walatên cîhanê de, pileya
120'em heye.

Berevajî ji îdiayên berpirsên
Komara Îslamî, ji hemû
wan salanên ku welat di bin
givaşa dorpêçan de bûye, ne
aboriya wê welatê geşe bi
xwe ve bîniye û ne jî rêyek
bo baştirbûna jiyanê xelkê
hatiye dîtin. Siyaseta derve
ya rejîmê bûye sedema dor-
pêçên çendalî li ser aboriya
Îranê û gendeliya sistematîk
a nav rejîmê jî wisa kiriye ku
xelk rastî bê hêvîbûnê bûn.
Piştî zivirîna Amerîka li
Bercamê, aboriya Îranê di
krîzeke bê mînak de ye ku
heta bi beravirkirin digel şerê
8 sale yê navbera Îran û Îraqê
kûrtir û zîyanên wê zêdetir

û berbilavtir in. Kêmbûn
yan jî jîdestdana dahata neft,
sedema kurtkirina bûdçeyê
ye. Aştî giştî ya nîrxan bi
awayê nivîncî du qat zêde
kiriye, nîrxa Tumen çen qat
dabeziye, qewareya aboriya
welat piçûktir bûye û şiyana
aboriya hevvelatiyan di sala
1399'an de bi beravird digel
sala derbasbûyî jî %25 kêmkiriye.

Di sala derbasbûyî de bûd-
ceya rejîmê rastî kêmanîna
bûdçeyê hat û eva jî wisa
kiriye ku encama wê bûdçeyê
givaşeke zêde bixê ser xelkê
da ku bikare bi komkirina
baca salane hin ji kêmbûna
bûdcê qerebû bike, û eva jî di
demekê de ye ku nexweşiya
Koronayê bi giştî bazarê têk
daye û pêka amar, xelkê pêka
sala derbasbûyî jî %7 hejartir
bûne, di îsalê de jî bi sedema
Koronayê 3 milyon kes karên
xwe ji deşt dane û çarenivîsa
pîşeya 5 milyon kes jî heta
niha rohn nîne û hikûmet jî
ti piştevaniyekî ji bazarê û

jiyana aboriya xelkê nekiriye
û hevdem bazara reş di Îranê
de berfirehtir bûye.

Îsal jî bo careke din parêzge-
hên Kurdistanê di aştî Îranê
de zêdetirîn rêjeya bêkarî
û enflasyon hebûye, di nav
parêzgehên Kurdistanê de,
Kirmaşan zêdetirîn rêjeya
bêkarî hebûye. Îlam û
Kirmaşan pêka amara fermî
du bajarên karesabaz in û
hevdem bi sedema daketina
zêdetir a nîrxê Tumen û
belavkirina Dolarê dewletî
li navenda Îranê, xelkê Kurd
pêka salên berê hejartir bûne.
Jinan du hemberê mêran
rastî krîzên aborî hatine.
Kêmtir welatek peyda dibe
ku derfeta kar bo jinan wekî
Îranê berteng be. Welatek ku
rûniştîyên wê yên jin serw-
eyê 15 sal zêdetir ji 31 mily-
on e, hejmara jinên xwedîkar
jî kêmtir ji 4 milyon û 400
hezar kes e. Di sala 1399'an

»»» Dom R:4

»»» Doma R:3

de, rêjeya betaliya jinan 14 hemberê rêjeya betaliya mêran bûye, bi vê yekê jî wisa tê xuya ku rewşa Korona rêjeya tundûtîjîya malbatî rû bi jin, zarok û kal zêde kiribe, lê ti amareke cihê baweriyê di vê derheqê de ji ber deşt de nîne.

Hejma pêketiyên Koronayê aliyê kêr sê hemberê amara fermî ye, hejma qurbanîyên Koronayê, sê hemberê wê rêjeyê ye ku rejîm ragihandiye. Krîza bingehîn a leşsaxî li Kurdiştanê, di demekê de karesata wê tê eşkerekirin ku rêjeya kadrên dermanî li Kurdiştanê nîveya rêjeya standarî ya cîhanî ye û rêjeya textê ICU yek li ser sê ya wê standara cîhanî jî nîne.

Derheq bi jiyana kedkaran û qata hejariya civatgehê di sala 1399'an de, dibe bê gotin ku pêka beravirda çalakvanên kedkarî, zêdetir ji %90 kedkar di bin hêla hejarî de ne. Givaşa aborî bi radeyekê ye ku kalîteya jiyan û xwarina xelkê bi berde-wamî di dabezîn de ye. Heta qata karmend jî hatine di bin hêla hejarî de, hevdem digel vê qata malnişîn jî, bi sedema kêmiya mûçeyan û dabezîna sindoqa bîme zêdetir ji hertimî jiyana wan di bin metirsiyê de ye. Belavbûna nexweşîya Koronayê, wisa kiriye ku nabera beriya qat rû li zêdebûnê bike.

Tevî vê ku detpêragihîştina rûniştîyên netewên xeyrefars bi îmkana û hewcehiyên pizîşkî û tendirustî nîne, piştî daxîştina dibistan û xwendîngehan, emrazên dîcîtalî û nebûna hewcehiyên hînbûn û lawzbûna înternet, metirsiya vê aniye gorê ku zarokên Kurdiştanê zêdetir ji berê rastî nexwendevariyê bîn.

Tenê di yek sala derbasbûyî de, 230 kolber û kasibkar rastî hêzên ewlehî û çekdarî yên rejîmê hatine û kirine bi armanc û di encamê de 67 kes hatine kuştin û 163 kes jî hatine birîndarkirin. Ji 34 kesên medenî ku kirine bi

armanc, 15 kes hatine kuştin û 19 kes jî hatine birîndarkirin. Li gelempera 40 qurbanîyên mîn, 11 kes hatine kuştin û 29 kes jî hatine birîndarkirin. Herwisa 223 haletên xwekuji (117 jin û 106 mêr) hatiye tomarkirin. Di navçeyên netewên din yên wek Belûçîstan, kuştina kasibkaran û serkuta xwenîşanderên bajarê Serawan mînakê e ji rewşa serkuta sîstematîk û sitema çend qatî li dijî wan netewan.

Tevî, rewşa herfîner a aborî û krîza Koronayê, di sala derbasbûyî de rejîma Komara Îslamî li ser siyasatên hertmîyên xwe wate mudaxilekirin di nav karûbarê navxweyî yên welatên deverê de, ew li ser ceribandina mûşek û bernamîyên xwe yên etomî rijtir bûye. Komara Îslamî bi rêya torên berbelav ji girûpên girêdayê bi xwe ve, şerê bi nûneratî kiriye karê xwe yê yekem û li dijî deverê bikar tîne. Her ji tora wan hêzane ve, di heyama sala derbasbûyî de berdewam berjwendiyên welatên Erebi û Amerîka di deverê de kiriye bi armanc.

Dezgehên ewlehî û zaniyarî yên Komara Îslamî li çend welatên cîhanê de hewla teror û binçavkirin û xîstina navtelikê ya dijberên xwe daye. Femandên Spaha Pasdaran îtiraf kirine ku di heyama 30 salên derbasbûyî de 17 milyar Dolar ji dahata welat bo karûbarê dîplomasi û çalakîyên leşkerî û berevanî, terxanê deverê kirine, lê Wezaretê Derve ya Amerîkayê dibêje tenê ji 2012'ê vê de, 16 milyar Dolar bo hêzên terorîstî û hevpeymanên xwe xerc kiriye. Heqîqeta wê pawanxwaziyê ku Tehran bi gotara olî û îdolojîkî ve girê xwariye, êdî niha li cem civatgeha cîhanî mijareke nezêl nîne. Komara Îslamî ya Îranê, bo xelitandina raya giştî nemaze li navxwe, carê wisa ye piştî xwe bi faktera olî û carê wisa jî hebûye ku bi faktera “rûmeta Îrana mezin”, girêdaye.

Zêdetirîn xerc, kêmtirîn deştkevt

Piştî tev ji wan krîzan ku cihê îşarepêkirinê ye, eva ye ku rejîm di kiryar de ti pêngavek bo çareserkirina krîzan, çî li asta navxweyî û çî di sata derve de navêje. Eva xelk in ku dibe xercê serkêşîya Komara Îslamî bidin.

Di asta derve de, hevpeymanên bi dizî û eşkere li dijî rejîmê di gorê de ne. Nîzîkbûna Îsra'îlê digel welatên Erebi û asayîbûna pêwendiyên ku tê çavnhêrkirin zêdetir berfireh bibe, di rastîya paşekêşê bi rejîmê de ye. Kirina bi armancê “Qaim Silêmanî”, femandê Spaha Qudis, Ebû Mihemed Mîsrî”, kesê duyem yê tora Qaîde û “Muhsên Fexrîzade” zanayê Etomî yê rejîmê li Tehranê, dirja ewlehî û lawaziya dezgehên ewlehî yên rejîmê zêdetir anîne berçav. Bêzarî ji siyasatên rejîmê û mudaxilekirin li welatên deverê li cem nîfşa nû û raya giştî û nemaze li welatên Îraq, Lubnan û Efxaniştanê ku bi kiryar li ser şeqaman û xwenîşandana xwe nîşan daye, îşareyek dinê ye bo şikesta siyasatên rejîmê.

Di asata navdewletî de, bernamîya mûşekî ya Îranê ku bûye gef li sr welatên Erebi, Ewropa û Amerîka û berjwendiyên li deverê, li ser maseya danûstandinê de ye û Ewropa û Amerîka li ser rijd in. Eva ku wek hevkeşe di gorê de ye, vê naçe di berjwendiyên rejîmê de dawî pê bê. Li hegera rêkvevtin yan berdewambûna rewşa niha li pêwendiyên Îran û Amerîkayê jî, komek heger û bûyer tene çavnehêrkirin, dibe bê balkêşandin ku rejîm di herdu astê navxwe û derve de li rewşeke lawaz de ye û ber bi lawaziya zêdetir ve diçe.

Di wan salên dawî de, bi sedema givaşên aborî, nerizayetiyan berdewam li dijî krîzên wek menceke herfîner ku kela deştîlatdariyê xîstîye hejandinê, heyam bi heyam dûbare bûye. Her yek ji wan mencane li encam û li domkerê mencên berê, her carê beşek ji tex û qatên civatgehê digel xwe xîstîye. Kelekbûna şikestên rejîmê û

bê hêvîbûna xelkê li rewşê, encama wê bûye ev ku panatiya nerizayetiyan li hember siyasatên rejîmê berbilavtir bibin. Siyasetek ku zêdetirîn xercê wê li ser deştê xelkê ye û deştkevtên wê jî bo ser sifreyên deştîlatdarn bûye. Bo derbasbûn li vê rewşê û bo dawî anîn bi rewşa bindeştî, bo gihîştin bi mafên netewî û demokratîk ku hemû netewe heşt bi serwerî û asayîşa netewî û kiramet û hebûna xwe bikin, em di Partiya Demokrata a Kurdiştana Îranê de li ser wê bawerê ne: Hevçarenivîsî dibe bibe bînemaya havxebatî û hevpeymanîya hemû ew hêzaneyê ku bi kiryar bawera wan bi demokrasî û mafê neteweyî ya netewên bindeşt yên Îranê heye.

Em li ser vê bawerê ne ku rewşa lawaz a rejîmê, pêgeheke guncaw bo xebat û têkoşîn li pêxema herifîna wê rejîmê û cihgirkirina sîstemeke demokratîk û fêdral diruşt kiriye. Derheq Rojhilatê Kurdiştanê jî li sala 1400'an de wek salên derbasbûyî em li ser lihevneztîkbûna Partiyên xebatkar û bandordar rijdtir in, û em li ser berdewmabûna Rasana Rojhilatê jî rijdtir in û Rasanê dikine xaleke bingehîn. Tevlîbûna ref bi refên keç û xortên bi bîrûbawer û şoreşger bo nav refa Hêza Pêşmerge Kurdiştanê li sala 1399'an de, hêz û girreke zêdetir li pêxema azadî û rizgariya nîştîmanê bexşîye. Her lewma em radigehînin bi hêvî û bihêztir ji berê, çepara Rojhilat bo berevanî ji azadiyê avedantir e.

Di dawiyê de, pirozbahiya sala nû û Newroza Kurdewarî bi tev xelkê emekdarên Kurdiştan, malbatên serbilindên şehîdan, girtiyên siyasî û malbatên wan û Hêza Pêşmerge Kurdiştanê û li tev wan kesan dikim ku jiyan xwe di pêxema xebat bo rizgarî terxan kirine û qurbanî dane.

Partiya Demokrata a Kurdiştana Îranê

Lêpirsyarê Giştî

Mîstefa Hicrî

Sala nû, sala xweamadekirin ji guhartinan re!




N: Dara Natiq

Bi dawîhatina sala 1399 a Rojî, salek din a pirr ji zext û givaş, tepeserî, giranî, hejarî û berxwedana qehremanane a tev xelkê welatparêz û azadîxwaz û bi taybetî ciwanên Kurdperwer û şoreşvan yên Kurdistanê bi dawî hat û bi Newroz û destpêka sala 1400 a Rojî rûpelek nû ji xebat û berxwedanek bi bandor û qarimanane ji bo herifandina rejîma dîktator û dagîrker a Komara Îslamî a Îranê û avakirina sîstemek demokratî û federal di Îranê de dest pê dike.

Newroz, cejna netewî a Kurd û Îraniyan, destpêka salê û nûbûna xwezayê ye. Nêzik bi 300 milyon kes ji netewên cuda cuda li seranserê cîhanê, nemaze di parzemîna Asiyayê de vê rojê bi rêûresmên cur bi cur û bi şadî û keyfxweşî ve pîroz dikin.

Xêncî nûbûna xwezayê, li gor gotinek efsaneyî, newroz roja serketina Kaweyê Asinger bi ser Zuhak de ye. Sala 1399'an a Rojî, salek pir ji êş û azar û qurbanîdan ji bo xelkê Îranê bi giştî û bi taybetî Kurdistanê bû. Di vê sala borî de xelkê Îranê û Kurdistanê zêdetir ji salên derbasbûyî hatine kuştin, hebskirin û bêhurmetî bi wan hatiye kirin û rewşa jiyan û guzerana xelkê roj li pey rojê xirabtir bûye. Asta bêkarî û giranî û serhildana diyardeyên civakî û bêhêvî û hejarî li hemî Îranê û nemaze Kurdistanê her roj zêdetir dibe. Di Kurdistanê de ger em bi awayek rêjeyî hesêb bikin, di wê heyamê de hejmara kesên kuştî, darvekirî, birîndar-bûyî û yên ku li bin îşkencê de ne û yan di zindanan de ne, zêdetir ji netewên din ên Îranê ye. Tepeserkirina xelkê



Kurdistanê û milîtarîzekirin û bi emniyetîkirina civatgeha Kurdistanê ji aliyê naven-dên ewlehî û dijîmirovî yên rejîma Komara Îslamî a Îranê ve, îsal li gor çend salên derbasbûyî pirr zêde bûye. Serbarê wan hemû cinayetên, dîsan cihê keyfxweşiyê ye ku encama wan hemû gorî, xwîn û rondikan heder neçû û sala 1399'an salek pirr destkevt ji bo bizava azadîxwazane a Îranê û şermzarî û rûreşiya rejîma axûndî a Îranê bû û di bin siya xebat û tekoşîna xebatkarên azadîxwaz û nerazî ji deştilata deştilat-darên çengbixwîn ên Komara Îslamî, pîrozî û qodsîyeta direwîn ya rejîma mirovkuj a Îranê têk şikandin. Bi vî awayî em di demekê de pêşwaziya sala 1400'an a Rojî dikin ku pîrozî û qodsîyeta rejîma paşvero ya Komara Îslamî zêdetir li hemû demekê şikestîye û stûn û bingehên zordariya wê jî ketine lertzîne, yekparçeyî têkçû ye û di sala nû de dê bi dehan pîrsgirêk û tengasi-yên çavniherîkirî yên din re ber bi rû bibe. Li hember de hêzên têkoşer ên rêya rizgarî ji destê zulma rejîmê û yekgirtîbûna wan, berevajî hêviya deştilatdaran di berfirehbûnê de ye, hêviya serkevtina yekcarî, qahîmtir

ji derbasbûyî ye. Bê guman hemû ew destkevtane û zelîl-bûna rejîmê, berhema xwîn û xebata xortên biwêr û netirs yên welat e ku di heyama zêdetir ji 40 salên derbasbûyî de ber bi rûyê hêzên pîrçek yên rejîmê hatine û bi hezaran kes ji wan di girtîgehên rejîmê de ne û di rojên cejnê de ji pexela germ ya malbatên xwe û şadiya Newrozê hatine bêparkirin. Lê roj bi rojê pêtir li ser mafên rewa yên xwe ku hilûşîna rejîmê û avakirina hikûmetek demokratîk li ser xwaşt û îradeya xelkê be, rijd in.

Rewşa ku niha Îran têre derbas dibe, pir aloz û awarte ye. Realîteya heyî di bin siya reş a rejîmê û siyasatên wê de bûye sedem ku eniyek xurt a cîhanî li hember de ava bibe û bi sepandina tehrîmên giran bi taybetî ji aliyê dewleta Amrîkayê û di dema serkomariya Tiramp de rejîmê li nav qopiya kirîzan de biçe qîne. Dorpêçên Amrîkayê bandora xwe li her biyavekê de kiriye û bi taybetî derbên giran ji peykerê aboriya Îranê xistiye. Lewma ji ber van zext û givaşên li ser jiyanê xelkê û serbarê hovetî, rijdiya serkutê û ewlehîkirina bajaran ji aliyê rejîmê ve, lê hêdî hêdî dengê nerazîbûna

xelkê û hêrsa pengurî ya wan tê bihîstin û êdî roj li pey rojê dengê nerazîtiya xelkê bilind û bilindtir dibe. Gendelî û tawanên hikûmet û deştilatdaran, asta xelkê nerazî, dengê şeqaman, givaşa bêkarî û nebûna derfeteke jiyanê asayî bo piraniya xelkên Îranê û sedan arîşeyên din, rejîm ber bi bimbêstekî îdarî û birêveberî ve biriye.

Ew rewşe wisa kiriye ku mafê jiyanê de destpêkî di wê welatê de neyê misogerkirin. Belkî krîz wateya sereke be ku bo lêkdana rewşa bimbêstî ya niha alîkar be. Krîz li birêveberî, krîz li siyaseta navxweyî û li siyaseta derveyî, rejîm xistiye nav tengahiyê, bi curek ku krîz bi krîz bi rê dike. Tevî ku sala derbasbûyî ji bo dujminê me sala şikest, têkçûn û sivikbûnê bû, ji bo neteweyên Îranê saleke bê destkevt nebû. Di vê rewşê de civaka Îranê û Rojhilat jî bi nîgeranî û tevî gelek pîrsgirêkan diçin pêşwaziya sala nû. Zêdebarî vê, Newroz ji bo me tê wateya rabûn û rasanekê din. Herwisa hêmayê yekbûnê ye. Lewma jî em bi dilekî teji hêvî ve, diçin pêşwaziya sala nû û qonaxa nû a xebatê. Di vê rêbazê de emê gavên xwe û rêzên xwe jî xurt bikin.

Newroz, mîrata çandî ya warê mem û zînê



N: Serbest Urmiye

Newroz, mîrateke bicihmayî û semboleke neteweyî ya dîroka gelê me ye ku hertim weke bingeha çandî û semboleke yekîtiya neteweyî jê hatiye mêzekirin û serbarê sedan salan hewlên dagîrkeran di qada tunekirin û bişvatina neteweyî de, hêj agirê newrozê di dilê gelê Kurd de geş e. Terz û titalên geşkirina agirê newrozê û pîrozkirina serê sala nû, weke beşek ji çanda neteweyî tê mêzekirin. Çimku di nava gelê me de Newrozê bingeha hebûn û şûnasa neteweyî tê hesibandin û beşek ji şûnasa neteweyî li gor vê tê pênasekirin.

Ji bo ku Newroz weke mîrateke çandî ya neteweyî were naskirin, hewce ye ku li gor penase û şiroveyên zaniştî yên li dor çand yan kultûrê, were berhevdan û di ve derheqê de hewil hatiye dan ku bi kutrî bikeve ber raya xwendevanên hêja.

Di derheq pênasekirina çandê di qada zaniştî de şiroveyên cuda hene ku her yek bi awayekê çand yan kultûrê bi hebûn û şûnasa mirov re girê dide. “Edward Burnett Tylor” mirovnasê Îngilîzî, çandê ji hevgirtina zanişt, ol, yasa, sinc, deb û edetan pênase dike ku meriv ji civaka ku têde dijî werdigire. Herwiha li gor pênaseya “William Isaac Thomas” yê Emerîkî jî, çand wate biha û nîrxên maddî û civakî yên civatgeheke mirovan. Di vê derheqê de “Guy Rocher” civaknasê Kanadayî jî, li ser vê baweriyê ye ku çand wate komek ji hizir, heşt û kiriyarên diyarîkirî ku ji aliyê pirraniya takên komelekê ve hatiye pesendkirin û ji bo ku ew komel di nava komeleyên

din de were xuyakirin, hewce ye ku wan rê û terzan weke sembola penaseya xwe bihesibînin.

Li gor şiroveyên han, deb û edet, pîrozî, biha, rêûresmên taybetî yên pîrozkirina newrozê di nava gelê Kurd de û geşkirina agir weke semboleke diyar û hêmayeke neteweyî, gelê Kurd di nava gelên cîhan û derdorê xwe de weke neteweyek xwedî sembol û taybetmendiyên xwe yên taybetî dide xuyakirin û serbarê vê hindê ku bi salan e hewlên berdewam di qada bişavtina neteweyî li Kurdîstanê de hatine û hêj tîndayîn, lê gel bi derwestbûn bi wan biha û hizran, kevnarî û şûnasa xwe pênase dike.

Di hemû heyamê ku dewletên dagîrkerên oldar de, hewil didan ku ji oladariyê weke alaveke bişavtina neteweyî li dijî gelê Kurd mifahê wergirin, agirê newrozê ji xwe re nîşane girtibûn û weke alaveke gunehbarkirina mirovê/a oldar, nemaze Misilman didan xuyakirin û piropaginde jêre dikirin. Ji derveyî bîr û hizrên oldariyê de jî, neteweyên dagîrker hewil didan û didin ku di rêyên efsane û telisman ve Newrozê derbasî derveyî çarçoveya erdnigariya welatê Kurdistan bikin. Bi terzekê ku nîfşên paşerojê ji çand û nasnameya xwe ya neteweyî havî bikin û di nava çandê dagîrker de bimehînin. Ji bo mînak pareke zaf ji dîroknasên Kurd, “Firdewsî” nivîskar û helbestvanê Fars ziman tometbar dikin ku bi nivîsandina pertûka “Şahname”ya Farsî, hewla alozkirin û serûbinkirina dîroka Newrozê di pêxema tinekirina neteweyî dide. Li gor baweriya dîroknasan “Firdewsî” biriyarê werdigire ku di pêxema zindîkirina zimanê Farsî de, sînoran tevlihev bike û destavêjê ziman û kultûra gelên derdor ku yek ji wan gelê Kurd e.

Di derheq dîroka Newrozê de, nivîsîna Dr. Mewlûd Îbrahîm Hesên, pitir balkeş



e. Ew bi tundî li hember “Firdewsî” disekine û wiha dibeje ku nivîskarê “Şahname”ya Farsî, Newrozê li gor efsaneyeke bê bingeh wate efsaneya Kawe û Zuhak, bas dike ku tu esaseke dîrokî jêre nahê dîtin. Raşt e ku Zuhak yan Aştiyag, dawî padişahê Mad bûye, lê ya ku “Firdewsî” hewil dide wî weke miroveke xwînmij bide naskirin ku cotek maran li ser milê wî bûne û diviya ku hemû rojan mêjiyê du xortan bixwarina, dûr e ji raştiyê û tu bingeh û raştiyeke dîrokî jêre nehatiye dîtin.

Li gor baweriya Dr. Mewlûd Îbrahîm Hesên, serkevtina Hexamenîşiyân, û hilweşiyana yekemîn deşthilata Kurdî û bûne xwedî deşthilat a êl yan taqimeke Farsan, bûye sedem ku kenveperestên Fars bi giştî û “Firdewsî” bi taybetî destavêjin vehûnana efsaneyên wiha bê esas, heya ku rûmeta gelê Kurd weke dijminê sereke li hember wan pê şêlû bikin.

Hizra giştî ya neteweyî li dor Newrozê weke mîrateke çandî û semboleke neteweyî, ji bilî helbestên navdarên Kurd weke Nalî, Wefayî, Mewlewî û Hecî Qadirê Koyî û ...hwd, piranî xwe di şahnameya Kurdî ya “Mem û Zîn” a Ehmedê Xanî de dibîne. Ehmedê Xanî bi danîna “Mem û Zîn” ê, hewil dide ku ji bilî beyankirina kul û keserên gelê Kurd ji bê dewletî û netifaqiyê, ji çand û şûnasa çandî ya gelê xwe jî xwedî derkeve.

Di dawiyê de hewce ye ku em ji vê helbesta Xanî yê mezin şîretê werbigirin û bikin hêvenê yekîtiya xwe li hember aliyên ku di hewla tunekirina me de ne.

“Ger dê hebûya me ittifaqek
Vêk ra bikira me inqiyadek
Rûm û ‘ereb û ‘ecem temami
Hemiyân ji me ra dikir xulamî
Tekmîl dikir me dîn û dewlet
Tehsîl dikir me ‘ilm û hikmet
Temyîz-i dibûn ji hev meqalat
Mumtaz-i dibûn xwedankemalat”



Nerîna Lîderan



“Mustefa Hicrî”:

“Bi hêvîdartin û bihêztir ji berê, çepera Rojhilatê bo berevanî ji azadiyê qahîmtir û avedantir e.”.



“Emmanuel Macron”:

“Îran nabe rewşa Bercamê ji ya heyî, metirsîdartin bike”.



“Rafael Grossi”:

“Îran bi berhemanîna çeka navkî nêzik bûye”.



“Benjamin Netanyahu”:

“Emê geşta balafirî di navbera Tilavî û Mekê de cî bi cî bikin”.

Me 5`emîn Newroza bêhempa destpê kir



N: Eskender Ceiferî

Me 5`emîn Newroza bêhempa destpê kir

Eskender Ceiferî

Me Newroza 2721`an jî dest pê kir. Komara Îslamî ya Îranê, tevgera partiyên Kurdiştana Rojhilat bi hûrî dişopîne. Heta partiyê Kurdî bikare hevrêziyê di nava refên aliyên cuda de pêk bîne, dilê Komara Îslamî jî nîgeran e.

Newroz sembola Kurdan e. Bûye remza şoreşê. Di dîroka hevçerx de, ti yek ji wan desthilatan ku Kurdiştan dagir kirine, nexwastine rêwresmên Newrozê bi rengêkî ciddî were pêşwazîkirin.

Kurdiştana Rojhilat parek ji vî welatê birîndar e. Komara Îslamî jî weke rejîma Pehlewî, riftarê bi Kurdan re dike.

Lehengên Kurdan bi dehan salan li girtîgehan dimînin. Mihemedsidîq Kebûdvend ji ber avakirina saziyê mafên mirovan, bi salan li girtîgehê bû. Mihemed Nezerî, Osman Mîstefapûr û dehan girtiyên din yen siyasî, tenê eger ji Elî Xamineyî rêberê Komara Îslamî re daxwaza lêbûrîne nivîsandibana, wê zûtir bihatane berdan.

Aliyên siyasî yên Kurdiştana Rojhilat, îsal jî weke sala 2017an li ser pêşwazîkirina hevpar ji Newrozê lihev hatin. Belkî ev zengila metirsiyê be ji Komara Îslamî re. Ji Ber ku berî van 5 salan, ti caran bi vî rengî, hemû partiyên nasyonalist û komonîst yên Kurdiştana Rojhilat li hev nêzik nebibûn.

Tevger û riftarên Îranê li



hemberî Kurdan, piraniya xalên Danezana Gerdûnî ya Mafên Mirovan ya ku ji aliye Neteweyên Yekbûyî ve derketiye, bînpê dike. Ew danezan di 10`ê berfanbara 1948`an de hatiye pejirandin. Danezan han bû belgeyê bingehîn ji bo tekoşîna mafên mirovan di hemû cîhan de. Lê li gora dekomment û belgeyan, hikûmetên weke Îranê qet guh nedan xalên wê.

Piştî biryara han ya peshwaziya hevpar ji Newrozê ji aliye partiyên Kurdî ve, tevgerê bihêz di nava Sipaya Pasdarên Îranê de çê bûye. Ew ditirsin vî carê Kurdiştana Rojhilat hemû hevdeng rabe ser piyan. Zan-yariyên veşartî li nava Sipayê amaje dikin ku bajarên Sine, Ormiye û Kirmaşanê bûne armanca sereke ya hêzên wê rêxistinê. Bi vî rengî ku endamên Sipayê, di nava xelkê sivîl de digerin û neyaran didin nasandin û biryar e her kesê ku behsa Newroza hevpar ya aliyên Kurdî bike, bê girtin.

Para herî zêde ya girtiyên siyasî li Îranê Kurd in. Ew di dadgehên ser bi Wezareta Dad ve tene dazandî. Ya-saya Komara Îslamî hemû rê li ber wan girtine. Li gora ya-sayên maf û kerametana, her kes li ber qanûnan wekhev in û ji parastina qanûnan bi awayekî yeksan xwedî mafê sûdwergirtinê ne. Hemû mirov li hemberî ciyawazî û her cure sepanan ên ku Danezana Cîhanî a Mafên Mirovan îhlal dikin û bi navtêdanê han didin van kiryanan, xwedî mafê hêvîşaneke wekhev in. Li Îranê hin xalên yasaya bingehîn behsa serdana malbatê di Newrozê de dikin. Lê girtiyên siyasî wan

xalan lixwe nagirin û nikarin Newrozê herin serdana malbatên xwe. Gelek ji girtiyên Kurd bi tometa şerê li dijî Xwedê bi darvekirin, girtina sermedî (hertimî) û hin jî bi dehan salan girtîgehê hatine cezakirin. Kesê ku bi tometa endametî di yek ji partiyên Kurdî de hatibe girtin, hertim dikra rewşên bi vî rengî dijwar û giran ji xwe re dike.

Newroz e û hîn kolberîkirin jî didome. Her sal bi sedan kolberên Kurd ji aliye hêzên sersînora Îranê ve tene kuştin yan birîndarkirin. Ev jî di demekê de ye ku Elî Xamineyî, rêberê Komara Îslamî ferman dabû hêzên ewlehî teqeyê li kolberên Kurd nekin. Serdozgerê giştî yê Îranê jî gotibû, ew kesên ku li ser sînora kolberiyê dikin nabe rastî zor û êrîşê bînin ji ber ku tekane çavkaniya jiyana wan kolberî ye. Wî behsa kolberên kurd ên ku li ser sînora bi piştan barbariyê dikin, jî kiribû û gotibû ew kesên kolberiyê dikin divê hêsanî ji wan re bê kirin û rastî zor û êrîşê neyên ji ber ku tekane çavkaniya jiyana wan kolberî ye. Li gora benda 25`an a Danezana Cîhanî a Mafên Mirovan, Xurek, cîl û berg, xanî, xizmetên tendurîstiyê û xizmetên civakî yên pêwîst jî di nav de mafê her mirovî heye ku bibe xwedî asta jiyaneke guncan a ku karibe gumrehî û tendurîstiya wî û malbata wî pêk bîne. Her mirov ji ber rewşa bêkarî, nexweşî, seqetî, bîti, pîr û kalitî an jî gava ku ji derfetê debarê bîyî hemd û vîna xwe bêpar bimîne û ji bo rewşên din, xwedî mafê ewlehiya civakî ne. Dê û zarok, pêştir û bi taybetî xwedî mafê pûtepedayî û alikariyê ne.

Efrîn û 3 salên dagîrkirinê



N: Ebdulazîz Qasim

Bi hatina roja 18`ê Adarê, ku bi roja reş tê binavkirin, sê sal li ser dagîrkirina Efrînê ji hêla dewleta Tirk ya dagîrker û çeteyên terorîst ve derbas dibin, sê sal ji tawanên rojane yên dijemirov bi qirkirin û koçberkirina miletê Kurd û guhertina demografî, dizîn û talankirina şûnwarên dîrokî û pereştgeh û goristanên pîroz, şewtandina dar, zeytûn û dariştanên wê, bi tundirtîn kiryarên hovane, hevdem digel bêdengiya saziyên navdewletî û bêtî tifaqa Kurdên Sûriyê û xemsariya tevgera Kurdî.

Ji vê roja reş, heta em bigihin çareserîya pîrsa Sûriyê li gor biryarên navdewletî, nemaze biryara 2254, divê em li ser çend xalên girîng rawestînin ji bo dîtina çareserîyeke demkî ya bilez ji bo rewşa Efrîn, Girêspî û Serêkaniyê bi taybetî û rewşa tevaya Rojavayê Kurdistanê bi giştî, lê di pêşiyê de, pêdivî ye ku amaje bi wê yekê bikin ku sedemeke serekî ya vê rewşa niha vedigire li ser nebûna rêkeftin û yekrêziya Kurdan, û bi taybetî siyaseta takekesî û tekali ya PYDê û binpêkirina peymanên yekrêziyê wekî rêkeftina Duhokê û Hewlêr 1 û 2, tevî ku mana ENKSê jî di nav rêzên "îtîlafê" de piştî sê salan ji dagîrkirina Efrînê ti qazancek ji bo pîrsa Kurdî nîne û zêdebarî ku ziyaneke mezin digihîne pîrsa navçeyên dagîrkirî.

Helbet bêtî yekrêziya Kurdî, wê rewşa Qamişlo jî wekî rewşa deverên dagîrkerî xirab bibe, lewra pêdivîya hemû aliyên Kurdî heye ku li ser rewşa xwe rawestînin û siyesta xwe bişopînin, û di serî de divê hemû aliyên Kurdan pêdagiriyê li ser rêkeftin û



yekrêziyê bikin, û ji bo vê yekê pêdivî me ya lez bi destpêkirina diyaloga Kurdî-Kurdî heye, û divê bi zûtirîn dem ev diyalog serbikeve û bi encamên baş li ser astên siyasî, leşkerî û rêveberî derkeve.

Xala din ya girîng bi dîtina min ku divê tevgera Kurdî hemû hewldanên xwe bike ji bo nasandina hebûna Tirkîyê wekî dewleteke dagîrker li Efrînê û herwiha ji bo nasandina hêzên çekdar yên îtîlafê wekî rêxiştinên terorîst, nemaze ku hin ji wan grûpan ji aliyê hin saziyên navdewletî bi terorê hatine gunehbarkirin.

Bi nasandin û tawanbarkirina çeteyên dagîrker bi terorê, wê Tirkîyê bi xwe jî bikeve di aloziyek mezin de, nemaze ku gelek dewletên Erebbî helwestên tund li hember Tirkîyê û îtîlafê hene, ji ber ku îtîlaf bi yekcarî ketiye di destê girûpa Îxwan Mislîmîn ya tundrew de û bûye darûdest û beşek ji projeyê "Neo-Ottoman" yê Erdogan û AK Parti û destêwerdana wê di deriyaya Spî, Sûrya û Lîbiyayê de.

Piştî 3 salên reş li ser Efrînê, hêja ye mirov destxweşî û amaje bi rola rêxiştinên sivîl û mafên mirov yên Kurdî û herwiha li hin rêxiştinên Sûrî jî bike, bi taybetî wekî Rawengeha Sûrî ya mafên mirov ya berêz Ramî Abdulrehman li ser xebata wan ya berdewam û dekomintkirina bi hezaran belge li ser tawanên dijemirovî yên dagîrkariya Tirkîyê û çeteyên wê, û şermazarkirina tawanên rojane yên opozisyona Sûrî "îtîlaf" li dijî xelkê Efrînê, ji bo bi dawîkirina dagîrkeriya Tirkîyê li ser Efrîn, Girêspî, Serêkaniyê, û darizandin û dadgehkirina tawanbar û çeteyên opozîsyonê yên terorîst.



Rejîma Îranê givaşeke zêde xistiye ser zozaniyan

Rejîma Îranê di parêzgeha Îlamê de ragihandiye ku, çûna bo zozanan wekî salên berê qedexe ye û niha dibe bi maşînan wan pez û terşê xwe veguhazin.

Koçerên parêzgeha Îlamê ku her salê ji deverên gerim ber bi zozanên çiyayên bilind ve bi rê dikevin, îsal rejîma Îranê şewaza berê ya çûn bo zozanan qedexe kiriye û ragihandiye ku dibe bi mifahvergirtin ji maşînen barhilgir, pezê xwe veguhazin.

Li wê derheqê de, Berpirsê giştî yên karobarê eşayir yê rejîmê, “Ferşad Yasemî” daye zanîn ku: “Çûn bo zozanan bi şewaza berê qedexe ye û rêgrî ji wan xudan terşan dike ku bi şewaza berê diçe zozanan.

Herwisa wî berpirsê rejîmê daye zanîn ku ew biryar bi hemû koçerên ku diçe zozanên Îlamê, hatiye ragihandin.

Hemû salan, koçerên devera Îlamê di dema taybet bi xwede, zêdetir ber bi zozanan li çiyayên, “Kebîr Kûh, Dînar Kûh, Sêwan, Manêşt, Qilareng, Şarezol, Dalaw” ê ve diçin lê rejîma Îranê tenê îznê dide wan koçeran ku bi maşînan ber bi wan zozanan ve herîn.

Pêka amarên rejîmê, 9 hezar û 736 malbatên kûçerî di parêzgeha Îlamê de hene ku nifûsa wan zêdetir ji 60 hezar kesî ye.



Li wê derheqê de, roja Çarşemî, 17ê Adarê, rejîma Îranê li Mîravê a girêdayê bajarê Şinoyê, di çiyayê “Şetre”yê de, 200 Pezê koçeran zewt kirine, rejîma Îranê wî Pezî di bazaran de difroşe.

Li bajarê Mihabadê, Spaha Pasdaran erdê xelkê zewt kiriye

Kesek ji xelkê Îsfahanê bi hevkarîya Spaha Pasdaran, devera geştiyarî ya xelkê gundê “Xelîfe” zewt kiriye û gef ji xwediyên wan erdan xwariye ku dibe bêdeng bimînin.

Pêka zaniyarîyan, beşa geştiyarî ya gundê “Xelîfe” ku milkê xelkê wî gundî ye, ji aliyê Kesekî ku xelkê bajarê Îsfahanê ye hatiye zewtkirin û di wan erdan de

kangeha berdên giranbih ya wî gundî bi hevkarî û beşdariya Spaha Pasdaran a terorîs talan dike.

Herwisa berpirsên Spaha Pasdaran gef li xelkê xwariye ku dibe bêdeng bimînin; Herwisa nûnerên bi nav nûnerê Mihabadê û Şewraya bajarê Mihabadê ku bi sedema gendeliya sistematîk piraniya wan hatine binçavkirinê, li wê derheqê de bêdeng mane.

Spaha Pasdaran û wî kesê xelkê Îsfahanê, bi dana bertîlê bi Saziya Paraştina Jîngehê, ew devera gundê Xelîfe zewt kirine.

Pêka gotina xelkê wî gundî, kevîrên wê kangehê nirexeke zêde hene ku ji aliyê wî kesî û Spaha Pasdaran ve bi awayekî hevpar tê talankirin û milkê xelkê hatiye zewtkirin.



Rejîma Îranê bêrîziyê bi kerameta mirovan dike

Di bajarê Pîranşarê de, sefên dirêj yên xelkê bona kirîna çend kîlo qend bi nîrx-êke kêmtir, bûye sedem ku jin û mêr çendîn demjimêran di sefên tevlihevbûyî de rawestî û rejîmê bi tenê di firotîngehekê de wê qendî bi nîrxê kêmtir difroşe.

Rejîma Îranê ku biryar daye di bajarê Pîranşarê de bi nîrx-êke bînxî ya 5 hezar Tumenî 4 kîlo qend bi welatîyên wî bajarî re bifroşe, dikarî di çend firotîngehan de wî karî bike, lê bi zanebûn û bi

armanca ragirtina xelkê ku jin û mêrên bi temen û kesên nexweş jî li xwe digere, li demsala sirê di sefên dirêj de bi çendîn demjimêran radi-gire.

Bi vî awayî, rejîma Îranê ku îdia dikir “em dê we bi pileya herî bilind a mirovahiye bigehînin”, bervajî bi her awayekî karîbe, bêrîzî bi mirovahî û kerameta mirovan dike.

Di dema ku mencên Koro-nayê di Kurdiştan û Îranê



de bajaran dide ber xwe, ew kiryara rejîmê bi tenê bi armanca bêrîzîkirin bi mirovahî, tûşkirina xelkê bi nexweşiyên epîdemîk û bêrîzîkirineke bi zanebûn bo kerameta mirovan e.

Helbestvanê navdar Mewlewî Tawegozî an jî Mewlewiyê Kurd



N: Keyhan Mihemedînijad

Mewlewî Tawegozî an jî Mewlewiyê Kurd li sala 1806'an li herêma Tawegoz a Başûrê Kurdistanê li bajarê Helebçeyê gundê Serşate a Xwarê hatiye dinê û hin dîrokna jî dibêjin navbirî li sala 1807'an hatiye dinyayê. Navbirî yek ji helbestvan û alim û filozofekî Kurd e.

Mewlewiyê Kurd zarotiya xwe di gundê "Bîjawî" yê nêzikî Helebçeyê derbas kiriye.

Di serdemê berê de li gor adetên wê serdemê diba zarok di hucreyên Feqîyan de ders bixwandibana. Wê demê bavê Mewlewî jî kesekî alim û zana bûye û li gundê "Bêjawî" yê ser bi Helebçê hucre hebûye û zarok perwerde kirine. Mewlewiyê Kurd jî wek adetên wî serdemê di hucreyê de li cem bavê xwe ders xwindiye û piştê jî bo ku xwandina xwe berfireh bike rû li xwendîgehê binavûdeng yê de vera Erdelanî û Babayiyan dike.

Mewlewî gelek belengazî dîtiye û piştî ku bavê xwe ji deşt dide heya heyamekê deşt ji xwendinê ber dide û neçar dibe ku bo xwedîkirina xwîşk û birayên xwe deşt bi kar kirinê bike.

Mewlewî piştî demekê deşt ji xwendinberdan, carek din deşt avêt bi xwendinê û di gelek deverên Kurdistanê de geriyaye û ber bi de vera Ciwanro ve çû û li wir jî çû bo bajarê Sine û di dawiyê de karî îcazeya xwe ya melatîyê li cem "Mela Ebdullrehman Notşeyî" li bajarê Silêmanî ya ser bi Başûrê Kurdistanê wergire. Mewlewî piştî tewawki-

rîna dersa xwe, li gundê "Çiroştane" yê ser bi Helebçê bû mela û feqî perwerde dikir.

Mewlewiyê Kurd her ji deşt-pêkê ve bi hesteke helbestvanî ve bîr û hesta sofîyetiyê jî li serî wî de hebûye û her ji ber wê hindê jî ber bi Tewîlle ve diçe cem "Şêx Usman Sîracedîn" ku yek ji xelîfeyê diyarîkirî yê Mewlana Xalîdê Neqîşbendî bûye û li cem wî terîqetê werdigre.

Mewlewî her zû dikeve nav dilê xelkê û dibe kesayetiyeke mezin.

Mewlewiyê Kurd hertimî piştevaniya xelkê hejar û kêmdahat kiriye û her bi wê sedemê jî gelek caran ji aliyê deşthilatdarên wê serdemê ve ji bo wî cih û mal hatiye terx-ankirin lê wî ew pişniyara wan red kiriye û her li ser piştevanî jî xelkê hejar, ji aliyê deşthilatdaran ve arîşe bo wî hatine çekirine. Her disanê jî Mewlewî li cem gelek deşthilatdarên wê serdemê, kesekî hezkirî bûye û hertimî qedrê wî jî hatiye girtin.


Mewlewiyê Kurd Helbestvanekî raştgo û xwedî helwet bûye û her piştevaniyek jî kiribe di derheq heq û raştiyê de kiriye û her tiştek ji cem wî raşt nebûbe li dijî rawestiyaye û jiyana dinyayê jî li cem wî gelek girîng nebûye. Pêka nivîsînan dibêjin Mewlewî kesekî rû xweş û qise xweş bûye.

Cerekî Mewlewî li mizgevtê Şêx Ebdulqadirê Muhacir li bajarê Silêmanî mijûl dibe ku xwe amad dike bo nimêja Mexrib, Mewlewî Ferenciyê dirêj jixwe kiriye, kabrayek gazî dike, Mele, Ferenciyê te bînimîj e firede, ew jî zû fire dide û deşt dîkin bi nimêja mexrib. Dema ku nimêj tewaw dibe hin ji xelk lê dipirsin, erê gelo her bi raştî Ferencî te bînimîj bû te fire da? Mewlewî jî dibêje, newele paqij û nimêjî bû, lê heya min kabra halî bikiriba û jêre bigotiba ku ev ferenciyê min nimêjiye, nek nimêja

mexrib ji deştê me derdiçû belkî nimêja Eşa jî ji deştê me derdiçû. Ya baş ew bû ku min got ez fire bidim heya axavtinên wî bibirim. Mewlewî digel jinekî bi navê "Enber" jiyanê pêk tîne û li gor dîrokna ew jine li malbatekî Efxanî bûye û Kesûkarê wê hatine Kurdistan û li de vera Helebçe mane. Pêka gotinan, Mewlewî gelek hej Enber xanima jina xwe kiriye, tê gotin piştî wê ku jina wî diçe ser dîlovaniya xwe, Mewlewiyê Kurd gelek xembar dibe û di qesîdeyêke bilind û ciwan de pesana wê kiriye.

Mewlewî piştî jîdeştîdana jina xwe, 7 salan berî ewê ku here ser dîlovaniya xwe, herdu çavên xwe ji deşt dide û kor dibe, hin dîrokna jî dibêjin dema ku jina wî çûye ser dîlovaniya xwe, du salan berî wê ku Mewlewî here ser dîlovaniya xwe çavên xwe ji deşt dide. Xuyaye ku Mewlewî piştî jîdeştîdana jina xwe û korbûna herdu çavên xwe, jiyana xwe gelek bi azar û nexweşî derbas kiriye. Karesateke dinêye nexweş ku di jiyana Mewlewî de hatiye serê wî, ev jî şewitandina pirtûkxaneyê wî bûye. Wek di nav pirtûkên dîrokî de hatiye nivîsîn, dane zanîn ku: "Şer û pevçûnek di navbera eşîra "Îmamî" û eşîra "Tawegozî" de çêdibe, û peşqelê agirê wî şerî dikeve nav xaniyê pirtûkxaneyê wî û pirtûkxaneyê wî dişewite." Tê zanîn ku di wê pirtûkxaneyê wî de gelek nisxeyên helbestên wî hebin û herwisa ew dîwanên helbestên wî û ew parçeyên helbestên wî ku berê xelkê nenivîsandine û Mewlewî jî ji ber nebûbe, hatibine şewitandin.

Tevî wan hemû nexweşî û narahetiyan, piştîşikeştina wî jî ji kulên wî zêde bibû. Tê gotin ku, rojekî Mewlewî siwarê guhdîrêj anku am bêjin kerê xwe dibe û kesekî jî hewsarê guhdîrêja wî radikêşe û digel wî bo sersaxiya xizmekî xwe çûne gundê "Pîrîs"ê, di rê de darek hebûye ku çîqa wê darê hatiye xwarê û diba



Mewlewî li ser guhdîrêjê, xwe xwar kiriba paşê karîba lê derbas bibe, dema zivîrandinê bi ew kesî ku digel wî bûye jêre dibêje dema ku em gihane wê darê bêje ku ez xwe xwar bikim ji wê çîqa darê nekevim, dema ku nêzî gundê "Hane Sûr" bûne û nêzî darê dibin, ew kesê ku digel wî bûye û hewsara guhdîrêja wî rakêşandiye bîra wî çûye jêre bêje. Mewlewî ji ser piştê guhdîrêjê li çîqa darê dikeve û dikeve xwarê û piştê wî dişkê û hildigrin û dibine mala wî, û têtê gotin ku her di encama wê bûyerê de li sala 1882'an diçe ber dîlovaniya xwe û bo hertimî helbest û gotinên xwe yê xweş û pirtûkên xwe bo nîfşa li pey xwe bicih dêhle. Hin dîrokna jî dibêjin di sala 1883'an de çûye ser dîlovaniya xwe.

Dîwana Helbestan, berhema wî ya herî navdar e. Bi zaravayên soranî û hewramî hatiye nivîsandin. Ji aliyê Pîremêrd ve du caran li Silêmaniyê hatiye çapkirin. Dîwana Mewlewiyê Kurd Ji aliyê nivîskarên Kurd yê wekî Mela Ebdullkerîm Muderis û hin kesên dinê ve jî bi nêrîn cuda û şîroveyan ve hatiye çapkirin.

Mewlewiyê Kurd bilî zimanê Kurdî, zimanê Erebi û Farsî jî baş zaniye û bi herdu zimanan jî helbest nivîsîne. Lê dîwana wî ku bi şewaza Hewramî hatiye nivîsîn pileyêke bilind di nav helbest û wêjeya Kurdî de heye. Belkî Mewlewiyê Kurd çû ser dîlovaniya xwe, lê helbest û gotinên wî yê xweş kevîne ser zimanê evîndarên wî û ti carî nayê jibîrkirin û wî navdarê Kurd navê xwe yê zîrîn di nav dîroka Kurdan de tomar kir.

Binpêkariyên mafê mirov di Kurdistanê de

Welatiyek Kurd bi danîna barimteyê ji girtîgeha bajarê Sineyê hate azadkirin

Roja Pêncşemî 14'ê Reşeme, Saman Kemrîmî, girtiyê siyasî yê Kurd û xelkê bajarê Bane, bi danîna barimteyê bi awayekî demkî heya qonaxa dadresiyê, ji girtîgeha bajarê Sineyê hate azadkirin.

Cezaya îdamkirina Saman Kerîmî berê jî ji aliyê dîwana bilind a welat ve hatibû redkirin û dosyeya navbirî bo gengeşekirina dûbare bo taya 1 a dadgeha Înqilab a bajarê Sineyê wekî taya wekhev, hatibû vehuastin.

Ew girtiyê siyasî, bi danîna barimteya 1 mîlyard û 500 milyon Tumenî ji girtîgeha bajarê Sineyê hatiye azadkirin.

Pêka gotina çavkaniyeke agehdar, dawî kombûna dadgeha wî girtiyê siyasî, 9'ê Reşeme ya îsal, bi tometa “endambûn li yek ji Partiyên Kurdî yên dijberê hikûmeta Îranê”, hatibû lidarxiştin û di dawiyê de navbirî bi danîna barimteyê ji girtîgeha bajarê Sineyê hate azadkirin.

Cezaya îdamkirina wî girtiyê siyasî, bi sedema kêr û kurî ji lêkolînan, li taya 27 a dîwana bilind a welat li bajarê Qumê hatibû redkirin û dosyeya navbirî bo lipeketina dûbare bo dadgehê hatibû veguhestin.

Ew girtiyê siyasî, 17'ê Xezelwera sala 1397an, li cihek bi navê “Tepey Silêman Beg” ya Baneyê, ji aliyê hêzên Îtîla'ata Spahê ve hatibû binçavkirin û bo lêpîrsînê bo Biryargeha Şaramferî ya bajarê Sineyê hatibû veguhestin.

“Saman Kerîmî” piştî 3 meh li binçavkirinê ji Biryargeha Şaramferî ya bajarê Sineyê, bo girtîgeha wî bajarî hate veguhestin û li heyama binçavkirina xwe de li “çavpêketina digel malbata xwe” bêpar mabû.

Ew girtiyê siyasî yê Kurd, 21'ê Xezelwera sala 1398an, ji aliyê taya 1 a dadgeha Înqilab a bajarê Sineyê ve, bi serokayetiya dadwer “Se'îdî” bi tometa “Bexî û hevkarîkirin digel yek ji Partiyên Kurdî yên dijberê hikûmeta Îranê” hatibû cezadan û li roja 13'ê Sermaweza wê salê cezaya îdamkirin û 11 sal girtîgeha te'izîrî bi navbirî re hatibû ragihandin.

Dosyeya wî girtiyê siyasî, 11'ê Befranbara sala 1398an, bo dîwana bilind a welat hatibû vehuastin.

Bêhzad Edwayî bi danîna barimteyê ji girtîgeha bajarê Merîwanê hate azadkirin

Roja Yekşemî 24'ê Reşeme, welatiyekî Kurd yê bi navê “Bêhzad Edwayî”, xelkê gundê “Silên” yê ser bi bajarê Sewlava, bi danîna barimteyê ji girtîgeha bajarê Merîwanê hate azadkirin.

Ew welatiye, roja Şemî 23'ê Reşeme, piştî bi dawîhatina heyama lipêrsînê ji girtîgeha îdareya Îtîla'ata bajarê Merîwanê bo girtîgeha wî bajarî hatibû veguhestin.

Hêzên ewlehî roja Sêşemî 5'ê Reşeme, navbirî bi bê hebûna ti belgeyek yasayî binçav kiribûn.

Girtiyek bi danîna kefaletê hate azadkirin

Roja Sêşemî 26'ê Reşeme, welatiyekî Kurd yê bi navê “Ferdîn Edwayî”, xelkê gundê “Silên” yê ser bi bajarê Sewlava, bi danîna kefaletê bi awayekî demkî heta bi dawîhatina qunaxên dadresî ji girtîgeha bajarê Merîwanê hate azadkirin.

Tohmata ku li dijî wî welatiyê hatiye sepandin, “hevkarîkirin digel yek ji Partiyên Kurdî yên dijberê hikûmeta Îranê”, hatiye ragihandin.

“Ferdîn Edwayî” roja Duşemî 29'ê Befranbarê, piştî gazîkirina wî bo îdareya Îtîla'ata bajarê Sewlava û di heyama binçavkirina xwe de ji “deştêpêregihîştina bi parêzer” hatibû bêparkirin.

Welatiyekî Kurd bi danîna barimteyê ji girtîgeha îdareya Îtîla'ata bajarê Urmîyê hate azadkirin

Roja Duşemî 25'ê Reşeme, welatiyekî Kurd yê bi navê “Teha Ateş Efrac”, xelkê Konexana ser bi bajarê Pîranşarê, bi danîna barimteyê bi awayekî demkî ji girtîgeha îdareya Îtîla'ata bajarê Urmîyê hate azadkirin.

Ew welatiye, bi danîna barimteya 300 milyon Tumenî bi awayekî demkî heya qonaxa dadresiya xwe ji girtîgehê hatiye azadkirin.

Tometa ku bi ser wî welatiyê de hatiye sepandin “hevkarîkirin digel yek ji Partiyên Kurdî yên dijberê hikûmeta Îranê” hatiye ragihandin.

Roja Yekşemî 19'ê Rêbendanê, ew welatiye bi bê hebûna ti belgeyek yasayî ji aliyê hêzên ewlehî ve hatibû binçavkirin.

Agirî

- ◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- ◆ www.Kurdistanmedia.com
- ◆ www.Agirimedia.org
- ◆ rojnamaagiri@gmail.com
- ◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE

E - Mail: Agiri2003@gmail.com

Hejmar (394)

NEWROZ PÎROZ

MEŞXELÊN ŞOREŞÊ BI
AGIRÊ NEWROZÊ GURTIR DIBE



Dezgeha Giştî ya
Ragihandina PDKÎ